

## **Şaredariya Borlänge – serîlêdana veguhestina dibistanê ji bo salên 2024/2025**

Welîyên zarokan yê ku xwendevanên wana diherin dibistana bingehîn, mafê wana yê veguhestina çûn û hatina dibistanê heye. Tenê ew kesên ku diherin dibistana binhehîn ya taybet, ji bo wana gerek salê carekê muracaeta xwe bikin.

Xwendevanên li cîhê malbatan bi cîh bûbin, û yê ku hejmarên wana yê kesîn demkî hebin, û ew kesên ku bi riya dîgîtal nekaribin muracaeta xwe bikin, dikarin heren cîhê servîsa navenda Beledîyê û ji wana forman bigrin û bi wî awayî dairin û muracaeta xwe bikin.

Ew kesên ku veşirtîbin, anjî ku ji bo parastina xwe veşêrin, divê bi riya xizmeta-e muracaeta xwe pêk neynin. Ewana jî divê heren cîhê servîsa navenda Beledîyê, û ji xwêre forman bistînin, û muracaeta xwe bikin.

### **Muracaeta ji bo salên wêren 2024/2025**

Ev muraceat divê di navbera tarîxa **4 – 24 adarê 2024 bibe, ji bo ku mirov zanibe di destpêka xwendinê wê salê heta meha tebaxê bizanibi ku ewana wê ji bo veguhestina dibistanê heq dikin anjî nakin fehm bikin.** Mirov dikari di navbera salê hemîde jî ji bo veguhestinê bike. Bes dema qerar danê dikare hinekî wext bikişîne, ji ber ku muraceat di ne dema xwede hatîye kirin.

Ji bo ku mirov bikaribe bi xizmeta.e muraceata xwe bike, divê e-kimlika mirov hebe. Ger ya te tunebe, divê bi riya Banka xwe tu yekê ji bo xwe çêke. Ger bi mobîla xwe zehmetî ji bo îmze kirina te hebe, divê tu geroka xwe ya webê di telefona xwe de biguhere, anjî bi riya kompûterekê pêk ve bînî. Bala xwe bidinê ku, ger wesayet ne ya yekî tenê be, divê herdû wêlî binê muraceatê îmze bikin.

Di navbera sala xwendinê de ger guhertin bibin, weke barkirin anjî guhertina dibistanê, divê mirov ji nûvre muracaeta xwe bike.

Ji tarîxa 4 ê adarê û pêde, mirov dikare muracaeta xwe bi riya xizmeta-e di malpera Beledîyê de: [Skolskjuts - Borlänge \(borlange.se\) bike.](https://www.skolskjuts-borlange.se)

### **Biryarên otomatîk**

Biryar li gorî qanûna dibistanan, bi awayekî teknîkî li ser awayê veguhestina dibistanan pêk ve tên kirin. Hinek muraceat bi destan ji terefê kesên ku ji bo veguhestinan kar dikin, tên biryar kirin.

### **Ji bo hejmarên te yê kesîn– bikaranîna hejmarên kesîn**

Agahiyên te li Beledîya Borlänge yê te danîne cem me, ji bo lê nêrinê, û karên admînisratîv û şopandina wana ye. Lênerîn di karê sîstemê de, hejmarên kesîn li gor parastina nivîsên di kompûteranda pêk ve tên. Li ser van parastinan tu dikarî hîn zêdetirîn agahiyan di malpera, [www.borlange.se/gdpr](https://www.borlange.se/gdpr). Bibînin.

### **Xebatên veguhestina dibistanê - Malper**

Agahiyên hîn zêdetir ji bo veguhestina dibistanan hûn dikarin li malpera Beledîya Borlänge de bibînin:

[Skolskjuts - Borlänge \(borlange.se\)](https://www.skolskjuts-borlange.se)